



Çiroken Mesnewiya Şerifa Hz. Mewlana

Niviskar
Sadik Yalsizucanlar

Werger
Aziz samur

DI KURDÎ DE XWENDINA HZ. MEWLANA

Em, bêçareyên dem ên modern ku dilê me brîndar û hişê me tehl bûye; ji aliyê xwendina çavkaniyên kevneşopîya me ya îrfanî ve, em li hemberî tengasiyên dijwar in. Ne ev tenê, em ji aliyê xwendina berhemên îrfanî û hîkêmî ve jî bi pirsgirêkeke wiha re rû bi rû mane: Ji ber ku ev berhem tecrubeyên manewî yên nivîskarê wan in, em nikarin wan mîna vegotinên modern bixweyînin, têbigîhîjin û bi vî awayê ji wan îstîfade bikin. Li ser vê gotinê xebatên ku di sala pêşîya me de li ser Hz. Mewlana dê bîr çêkirin, di serî de li hember talûkeyeke wiha rû bi rû ne. Ev zanayên me ên mezin, di berhemên xwe yên kevneşopîya me ya îrfanî de ne. Her wiha ji ber ku ev berhem muşahadeyê wan in û heta meriv dikare bibêje ku ji hezaran yek muşanedatê wan in; astengiyên ku çareserkirina wan zehmet in, li hêviya ên ku dê filmên wan derxin holê ye. Ger ku gotin bê ser Hz. Pîr, divê ku di Mesnewiya Şerîf de sîrrên wî yên herî mezin bê lêgerîn.

Mesnewiya Şerîf jî ku bê şerh û klavûz bê xwendin, dibe ku feyîz bide; lê belê her dem dê têgihîştina wê kêr be, çî bi çîna jî dê xeletî tê de hebe. Li ser van rastiya meriv dikare bibêje ku rêya têgihîştina ji Hz. Mewlana û Mesnewiya Şerîf û berhemên îrfanî yên mîna vê, di xwendina şerhên ku li ser wan hatine nivîsîn de derbas dibe. Bi qenaeta min, di nav şerhên Mesnewiya Şerîf de a herî baş şerha Bûrsevî ye. A herî zêde ku bala meriv dikşîne ser xwe û xwediyê elaqeyê ye ev e. Şerha ustad Şefîk Can jî ji hêla wesfê ve herî baş e; lê belê disa jî destê meriv ji şerha Bûrsevî nabe.

Mesnewî, hemû di hijdeh beytên pêşî de veşartî ye. Sîrrê hijdeh beytên pêşî jî di beyta pêşî de ye. Gîza beyta pêşî jî di tîpa beyê de ye. Tîpa be jî, di xala binê xwe de veşartî ye. Ji Resûlê Xwedê (s.x.l.) hatiye ragihandin ku: “Qur’an di Fatîheyê de, Fatîhe di Besmeleyê de, Besmele di tîpa beyê de, tîpa be jî di xala ku ji hev cihê dike de veşartî ye. Vaye ez jî ew xal im ku ji hev vediqetîne.” Em ji şerha Bûrsevî hîn dibin ku şîkayet beriya hîkayetê tê:

“Her herikandina neyê ku ji te digihîje dilê min ê qelaştî, dibe neya ku li ser gora min dinale. Ez ji canê canê glîdar im; lê belê tenê ne glîdar im, rîvayet(hîkayet) dikim. Ew, neyêke wisane ku ji lêva canê dûr e dinale. Guhdarî bike ji neyê hîkayet dike, jihevqetîne ku ji wan lêvên mîna şekir dûr maye gilî dike... Ez, xala binê beyê me... Hemû mane yek bû ne, ev çend dubare çî ye... Her tişt bi min li pêya dimîne(wedet, sutûn, însanê kamil)...”

Waxta ku Bûrsevî sîrrên beyê vedibêje, van şerhan lê datîne:

Li besmeleyê hatina wê. Sûreya Tewbeyê bê besmele nazil bûye; lê belê bi beyê dest pê dike. Bi destpêkirina wê ya ‘Bîşnev...’ (guhdarî bike), tê wateya ku Mesnewiya Şerîf li gorî besmeleyê û wekî ku bi besmeleyê destpêkiribe. Bi Wî re, bi navê Wî û destpêkirina bi Wî... Û ‘Bîşnev...’ bi nûnê dawî dibe, sirra “Ez xala binê beyê me” pêk tê. Nûna ku kom dike, dayika kitêbê ye. Eslê kitêbê heyîn e, tenê ‘Ê ku distîne, ji tayekî distîne’. ‘Her tişt bi min li ser pêya disekine.’ Ên ku hene, bi melekûtên xwe qaîm in, li ser pêya disekinin; melekût di destê qudreta Xwedê de ye. Be, destpêkirinê danîşan dike û ku ew destpêkirin jî Mesnewiye, qîmeta jimarî ya beyê 2ye, ji ber vî balkêş e. Elîf yek e, be duyem e. Elîf, yanê 1, hêmaya Wahîdîyetê ye. Xwedê, di alema tecelliyê de wahîd e, li alemên xeybê yên ku tecellî di wan de tune e, tek e, ji wî re tekiya mutlaq, ehediyet tê gotin. Be, ji îsmê wî yê şerîf ê Letîf dizê. Mesnewiya Şerîf ji tecelliya navê wî yê Barî ku Letîf e. Heta ku lutfâ ruh tune be, ketina nav alemên heqîqet û letîfeya nemimkûn e. Be, danîşana xwuyabûna afirînê ye. Mirov, di taayyunê de mîna elîf e. Ji ber ku Mesnewî derheqê alemên li ber çavan û ne li ber çavan de ye, di şûna elîfê de be hatiye hîlbijartin, pêşîya elîfê hatiye. Lewra xuluqandina mirov, girêdayê taayyunê ye. Ji ber vî, di peyîva beyê de elîf tabîê beyê ye. Ji ber sirra ‘Ê ku ewwel e, ewwel e’ be li pêş hatiye danîn. Xala yekbûnê, ya ku li binê beyê ye, danîşana xwuyabûyîna asta bê ewweliya Xwedê ye. Sîrrê mirov ji virê tê. Xala duyemîn, ya ku di Bîşnevê de ye(a di

şyê de), danîşana xwuyabûna wesfên Xwedê ye. Ruhê sultanî, mezharê wî ye. Xala sisiyan (a di şyê de), danîşana xwuyabûna fiêlan (ef'al) e. Ruhê heywanî, mezharê wî ye. Di serî de bi be, tuwanca derketina holê ya teşe û wateyê tê kirin. Ji Hz. Elî hatiye neqilkin ku sirrê gotina 'Ez xala binê beyê me', danîşana xelîfetiya mirov, destpêka xelîfetiya wî û wergiriya Heqîqeta Muhemmedî dike. Nexşên ruhan, sûretên cîsîman, madeyên sirûştî û hêmanan, ji Heqîqeta Muhemmedî hatine çêkirin, zayîn û şewq dane. Ev pirayiya bêdawî, ji wê yekbûna bêsinor tê. Ku waxta xala be dubare bibe, dibe te û se. Ev zêdebûna xwuyabûnê, ji yekbûna beyê re nave asteng. Ji ber vê sirrê ye ku 'Di her tiştî de, ji bo Wî delîlek heye. Ev delîl, îşaretê yekbûna Wî dike.'

Be li gorî elîfê şikandiye, xêza şikestiye. Ev nefsbîçûkî bi vê nevê dibe sedemê mezinbûnê. Hatiye gotin ku, 'Ën ji bo Xwedê nefsbîçûkî nîşan didin, Xwedê dereca wan bilind dike'. Be, di erebî û farisî de erka nêzîhevkerin û bihevdedanîtinê dibîne. Ku bi beyê dest pê dike, tuwanc dike ku Mesnewî, peywira gihandina bi alî yê ku esl e û ciyê cî ye ve dibîne. Xala tek a beyê, meznahiya hîmmeta wî danîşan dide. Bi vî awayê ji xeynî yekbûnê tu tiştî qebûl nake. Ji ber vê hîkmetê ye ku 'Tu bêje Xwedê û pişt re dev ji wan berde' hatiye gotin. Be herfa amil e, ê ku çêdike mîna xwe zêde dike. Rewşa beyê, dirûvê halê murşîdê kamil pê dixê. Murşîdê kamil, him xwe jî bi şikîna rastî teserrûfê dike, him jî murîdên xwe ji xerabiyên nefsa emare xelas dike û wan dike nefsbîçûk.

Be, îşareta Belhê ye ku ev der ciyê welidîna Hz. Pîr e.

Tuwanca navê Berr dike.

Behr, tê wê wateyê ku, Mesnewiya Şerîf, behreke bêqerax e.

Be, tîpa pêşî ya bîdayetê yanê destpêkê ye. hwd. hwd. hwd...

Ji van xalên ku me ji Bûrsevî da ragihandin jî tê fêmkirin ku rastiya Hz. Pîr di Mesnewiyê de ye. Heta ku ew baş nê xwendin û fêmkirin bi awayekî heqîqî nemumkûn e ku filmekî Hz. Mewlana û Mewlewîtiyê bê çêkirin, vegotineke xweş bê nivisandin, şanonameyek bê derxistin.

Ji nêrîn û nêzbûneke wiha dûr û bi bergeheke dembihurî, serkî, hengirî, dîrokî, civaknasîti ji vegotena ew behra bêqerax wê bi rastî dûr be. Ji Hz. Mewlana û sirrên wî yê nîrfanî, tenê ên ku li ber derê wî meded dikin dikarin fêmbikin.

Digel vî qasî ev jî meseleya nisîbê ye.

Di edebîyata me ya Rojhilat de, mîna Kitêbên Pîroz, bi metelokan vegotina heqîqetê kevneşopiyek e.

Hîkaye, meriv dikare bibêje ku tuwanca dunyayê ye. Hunermendên rojhilat, maneya jiyan û dunyayê bi awayekî çîrokî vedibêjin. Mesnewî bexçeyekî veşar e. Hezretî Mewlana, li ser birca eşqê ye. Eşq, puxteya hebûnê ye, haveyna wê ye. Xwedê, çavkaniya eşqê ye, yek ji wan navên Wî yê bêdawî Wedûd e. Ew sirrê sirran, derketina temamê eşqan e. Mewlana, wekî evîndarekî Xwedê, bi agirê ku Şems pêxistiye şewitiye û li ser dîwana wî ya mezin, gotinê evîne ku aqilan birîndar dikin gotiye. Mîna ku bangî rastiyan çaxa xwe bike, dîn li gorî wan rastiyan nû kiriye. Mewlana, wekî îrşadvanekî, helbestvanekî zêrîn e ku helbestê biçûk dibîne e. Mesnewî, navê taybet ê wê kevneşopîyê ye ku macerayên bêserûber ên mirovan bi metelokan vedibêjin. Zanyarê mezin, di Mesnewiyê de çîrokên bi hîkmet ku roja me jî ronî dikin vedibêje. Di vê pirtûkê de çîrokên biîbret ê ku di Mesnewiya Hz. Mewlana de ne hûnê bibînin. Ev çîrok, nav dilê welatê Rûma li Konyayê ku wê çaxê bi vî navê hatibû bi navkirin, ji bexçeyê Mesnewî ya Mewlanayê ku bi eşq sema girtiye û tijî bi hîkmetin hatine civandin. Heta ji destê me hat, bi awayekî ku bêdîlîşkestina ruhê wan bèn ber destê we em xebitîn. Dema xwendina çîrokan, hûne bi Zanyar re derên gereka xweşku bêhn li meriv diçikîne.

Ji bilî Hz. Mewlana, kevneşopiya me ya çîrokan de Şêx Sadî Şîrazî, Ferîduddîn Attar, Ahmedê Xanî, Molla Camî, Nîzamî û navên hwd. di berhemên xwe de hunera çîrokên kevneşopî yê pîrî caran bi kar anîne.

Ev çîrokên di vê behremê de ku ji aliyê Azîz Samûr ve bi rêtina rondikên çavan li

kurdî hatine wergerandin, her cara ku meriv dixweyîne, meriv hîkmet û tehmên ji hev cihê jê distîne.

Di kurdî de ku yek ji wan zimanên kevnare yên Mezopotamyayê ye, dîtina çîrokên bihîkmet yên Hz. Mewlana ji aliyê min ve bextiyarîyeke, ji aliyê werger û xwendevanan ve jî divê weke himet û lutfekî bê hesabandin.

Çapa pêşî ya xweser a vê pirtûkê bi turkî ji aliyê Weşanên Tîmaşê ve Tebaxa 2003yan hatibû kirin.

Ji weşanxaneya bijarte ya Nûbiharê re ku li welatê me bi zimanê kurdî pirtûkan diweşîne, ji ber hewldana wan a gihîştindina vê behremê ya ji xwendevanan re minetdar im.

Ji bo wergera hendaze û hêja ji dildar Azîz Samûr re jî wisa.

Kêmasî ji me, xweşikî ji Wî ne.

Sadik Yalsizûçanlar

SÊ ŞÎRET

Nêçîrvanekî, bi rêya faqê çivîkek qefaltibû. Hilanî û danî ser destê xwe. Çawan ku danî ser destê xwe, çûk hat ziman û got:

“Hetanî îro te ew qas ga û pez xwar. Li tiştê ku te xwariye bifikire. Tu têr nebûyî, ku çavê te li çend gram goştê min e? Ku wan tu têr nekiribî, ez ê çi bikim? Min berde.”

Nêçîrvan, him jî peyvîna çivîkê re, him jî ji tiştê ku heta niha xwariye re mat ma. Çivîkê xeberdana xwe berdewam kir.

“Ku tu min berdî ez ê sê şîretan li te bikim. Sê şîretên ku di hemû jiyana te de dê rê nîşanî te bidin, tu didî bi yek gezeke goştê çivîkê? Baş bifikire!”

Nêçîrvan fikirî, qerarê xwe da û got:

“Qebûl. Ez ê te berdim. Ka çi ne şîretên ku te dê bida min?”

Çivîkê got:

“Lê belê şertekî min heye.”

Nêçîrvan bi gotina, “Îcar tu şert datîni ber min?” pirsî.

Çivîkê got:

“Ku tu qebûl bikî...”

Nêçîrvanî got:

“Baş e. Ka bibêje şertê te çi ye?”

Çivîkê got:

“Şîreta pêşî ez ê di destê te de bidim, a duduyan li ser xaniyê li hember, a dawî jî li ser darê ez ê bibêjim.”

Nêçîrvanî ev jî qebûl kir.

Çivîkê got:

“Şîreta min a yekê, tiştê ku dê nebe kî dibêje bila bibêje bawerî pê neke!”

Nêçîrvanî destê xwe vekir û wî ew berda. Çûk bi dengê “pîrr” firiya û çû ser xanî. Û wê got:

“Tiştê ku çû mede dû. Ji xwe re meke xem! Piştî ku derfet ji destê te çûn xemgîn mebe. Qîmeta dema ku tu dijî bizanibe, wextê xwe bi poşmaniyê derbas neke. Di zikê min de durrek xwedî bihayê bêhemta hebû; lê belê ji destê te çû. Ne nisibê te bû ye.”

Nêçîrvanî got: “Heywax. Min çi kir, min tu berdayî?” û li çokê xwe xist

Çivîkê got:

“Qasek berê min çi got ji te re? Piştî tiştê ku ji destê te çû li çokê xwe mexe, bi poşmaniyê wextê xwe derbas meke. Ka te şîreta min a pêşî ji bîr kir? Min ji te re negot: kî çi dibêje bila bibêje, tiştê ku dê nebe baweriya xwe pê meyne.”

Hişê nêçîrvan hat serê wî. Çivîkê bi aşkerayî henekê xwe pê dikir. Nêçîrvanî got:

“Ya din... Ka şîreta te ya sisiyan jî bibînim.”

Çivîkê êdî li ser darê bû. Û wê got:

“Dev jê berde! Ka te her du yan girt ku ê sisiyan dixwazî! De hadê bi xatirê te.”

Çûk ji ber çavan firiya û çû.

Nêçîrvan li pey wê bi mat mayî nihêrt.

DILDARÎ

Femandarekî ku rêveberiya welatekî dikir rojekê bi merivên xwe yên xas re derketibû nêçîrê. Li hespê herî xweşik ê ku seyîs bijartibû siwar bûbû, kûçikê ku baş bêhn distand jî dabû ba xwe, di hiyama nêçîrê de li daristanê nêçîr dikirin. Wexta ku di nav gundekî daristanê de derbas dibûn, cariyêke ku bi xweşikiya xwe mîna horiyên bihuştê bû dît. Çawan ku çav bi qîzikê ket, dil berdayê.

Li merivên xwe ferman kir:

“Ger ku qebûl bike, hema a niha bergîdana wê bidin, bila bi me re were.”

Ji xwediyê wê pirsîn û bi rizaya wî, keçik gihîste heyeta Femandar. Gava ku nêçîr qediya, fetilîn qesrê. Femandêr ew kir pîreka xwe û bi dildarî xwe bi wê ve girêda. Ew jî mirov bû, mîna her mirovî, her dem li ser yek qerarekî nedisekinî. Jinik nexweş ket. Bi nexweşîneke giran ket nava cî û nivînan. Li welatê wan çî qas hekîmên binavûdeng hebûn, gazî hemûyan kirin. Femandêr ji wan re got:

“Tenduristiya min ne grîng e, min ji bo ruhê canê xwe gazî we kir. Ew nexweş e. Kî ku wê baş bike, dê deriyê gencîneyên min jê re heta dawiyê bêne vekirin.”

Hekîman di nav xwe de heyetek hilibjartin û tafilê dest bi xebatê kirin. Çend caran nexweşa wî venihêrtin. Ji bo ku tespîteke baş derê holê xebitîn. Rêveber di nav meraqê de bû. Serekê hekîman çû balê û jê re got:

“Sultanê min, hûn xemgîn mebin, em dê wê baş bikin. Bi dostê me re çend derman hene.”

Dest bi başkirinê kirin.

Di navê de çend rojakî derbas bûn. Cariye bi tu awayî baş nedibû, roj bi roj diheliya û diçilmisî. Rêveber, ku bêçarebûna hekîman dît, du rekaet nimêj kir û îstixfara xwe anî, destê xwe vekir û dia kir. Bi vî awayê di xew re çû.

Di xewna wî de kalekî porspî jê re got:

“Mizgîn li te ey Rêveber! Daxwaza te qebûl bû. Sibê dê yek ji me were qesra te, wî hahaneka qebûl bike û nexweşa xwe nîşanî wî bide.”

Rêveber bi kêfxweşî şiyar bû. Çavê wî di şivakê de li benda sibê ma. Bi berbanga sibê re kalekî derket û hat. Zûzûkan derî lê da vekirin û wan ew keremê hundir kirin. Piştî ku li halê wî pirsî û hinekî mijûl bûn, wî ew bire ba jinikê. Kal, piştî ku li jinikê baş nihêrt got:

“Hekîmên we, ew mehf kiriye. Niha bila her kes ji odayê derkeve, divê ez bi wê re bitenê bimînim.” Ode vala kirin.

Mêrik, nebza jinikê girt, ji jinikê navê welatê wê, jiyana wê û malbata wê pirsî. Hemû sirrên wê hîn bû.

Dema ku nebza wê digirt, bi kîjan navî nebza wê zêde biavêta li ser wî navî bi kitekitî disekinî û pirs dikirin. Wexta ku behsa Semerqand û zêran dibû, hêcana wê zêde dibû û nebza wê pir zêde diavêt.

Mêrik çû ba Rêveber û jê re got:

“Cariya te evîndarê xişirfiroşekî Semerqandî ye. Ji vê re nexweşîna dilan tê gotin. Ku negihîje desgirtiyê xwe, dê bimire, êdî tu dizanî.”

Rêveber dizanibû ku pêşiya nexweşîna dil neyê girtin dê ev nexweşîna bimirinê bi dawî bibe. Zûzûkan ferman da xulamê xwe. Çûn xişirfiroşê Semerqandî dîtîn û anîn. Ê wan ew zewicandin.

KU JI HIRÇÊ DOST DERÊ

Li daristanê, marekî mezin bela xwe li hirçekî dixwe. Mar xwe li nava hirçê lefandibû û wî ew dişidand. Hirç bi qîrîneke bilind alîkarî dixwest û dipirpitî. Di vê xirecirê de merivekî ku di wê derê de derbas dibû qîrîn bihîst û hat. Şûrê xwe kişand û ew mar kuşt. Bêhna hirçê derket. Piştî vê bûyerê hirç, dev ji mirovê ku wî xelas kir berneda. Ji wî mêrikê re got:

“Te ez xelas kirim, ez dixwazim bibim dostê te û xizmeta te bikim.”

Mêrikî, nedixwest lê li ser israrê wî bêçare ma û got:

“Wisa be baş e... Ka were.”

Hirç, edî ji ber derê wî nediqetiya. Dost û cîranê mêrik, lê şîret kirin û jê re gotin:

“Ji hirçê dost çênabe. Li şûna ku dostê mirov ê ehmeq hebe, bila dijminê mirov ê aqilmend hebe çêtir e. Em ditirsin ku tiştek were serê te. Berî hirçê bide, bila here.”

Lê belê meriv ji ber ku rastîtiya hirçê didît, hêdî hêdî cihê difikirî. Xwe bi xwe digot: “Çavnebariyên dikin. Ji ber ku alîkarekî min ê wiha bi qewet heyê, çavê wan li min e.” Û bi vî awayî bala xwe nedida wan şîretan.

Rojek ji rojan, ji bo ku êzingan biçîne çû daristanê. Hirç jî li balê bû. Jixwe ka kengê ne li balêbû?!

Meriv gelek xebitî, dar birî, rast kir, wexta ku westiya ji bo ku bêhna xwe derxe li bin siya darekê xwe dirêj kir. Hirç jî li ba wî mexel hat.

Qasek şûn de mêşek hat û li ser sûretê mêrik xwe danî. Hirç ji bo ku ji xwediyê xwe re başiyê bike, berî mêşê da. Mêş reviya, qasek din dîsa hat. Hirç dîsa berî dayê. Mêşê dîsa xwe danî. Paşiyê hirç acis bû û fikirî ku ji kuştina mêşê pêştir çare tune.

Bazda çû kevirê mezin ê pehn dît û anî. Ji bo ku mêşê bikuje heta Xwedê qewet dayê kevir bilind kir û avêt ser sûretê xwediyê xwe. Mêrik ji serê xwe bi giranî birîndar bû û li wirê mir. Ji ber ku li dostê xwe guhdarî nekir, wekî ceza ji canê xwe bû.

ÇÎROKA DERNEKETINA JI HEDÊ XWE

Mişkekî, xwe avêtibû hefsarê hêştirê û pê re diçû. Ji ber ku li bilindayî û li pêş hêştirê diçû, quretî û pozbilindiya wî jî pê re diçû.

Hêştirê, di heyata xwe de wekî wî mişkî pozbilind, xwefiroş û ku wiha xwe bilind didît nedîtibû. Mişkî xwe bi xwe dipeyivî:

“Ez çi rêberekî mezin im û haya min ji min tune. Min bi sityê hêştirê girtiye û wê dibim.”

Qasek şûn de, riya hêştirê derket ser çemekî. Ferata avê, di vî çemî de diherikî. Hêştir sekinî. Şireshira şîpa avê bû diçû. Lê belê bi rehetî ew dikaribû derbas bibûya. Ji tirsan rengê mişk qelibûbû.

Mişkî got “A ji te re, niha ez ê çi bikim?”

Hêştirê, li mişkê ku qasek berê ji quretiya wî mirov nikaribû xwe nêzî wî bikira nihêrt û jê re got:

“Xêr e dostê min! Çi bû?”

Mişk lalokî bû,

“Na, na tiş tişteke tune!”

Hêştirê got:

“De hadê lingê xwe hilde û bikeve avê, ka qey ne tu rêber î?”

Mişk di zoriyê de mabû, û wî got:

“Li vî çemê mezin ez ê çawan derbas bibim?”

Dengê wî nerm bûbû û per û baskên wî şikiyabûn. Got:

“Av zêde kûr e.”

Hêştir hêdî hêdî ket nav avê. Çend gav avêt. Av hatibû çokên wî. Ji mişkî re got:

“Qet metirse, binêre wa ye av tê çoka min!”

Mişkî gunê xwe bi xwe anî û got:

“Ustadê Ezîz! Ava ku bavê çoka te, Xwedê zane çend metre dê bi ser serê min de biavêje.”

Hêştirê mîna ku kevirek bixe şûna wî got:

“Wisa be careke din xwe mezin mebinê û ji hedê xwe dernekeve!”

Û gotina xwe berdeyam kir, “Xwe bavê ser qopikê min em herin.”

HEBÛNA BA YÊ TUNEBÛNA MIN

Rojekê kermêşek hate ba Hz.Suleyman û jê re got: “Tu qasidekî wisanî ku, te bi edaleta xwe navûdeng daye û tu hukum li ba, agir û avê dikî. Alîkariya te dixwazim. Di behra te ya edalet û şabaşê de para min jî heye.”

Qasidê Xwedê jê pirsî,

“Ka çi dixwazî, derdê te çi ye?”

Kermêşê got:

“Qet mepirse Sultanê min! Tu tehmek ji heyata me re nemaye. Dunya li me bûye zîndan”

Hz. Suleyman pirsî,

“Çi bû ye, çima wisa dibêjî?”

Kermêşê got:

“Ez hatime ku bayê ji te re gilî bikim. Her dem me aciz dike, li me zilmê dike. Em herin kê derê ji destê bayê xelas nabin. Hizûr ji me re nema.”

Qasidê Xwedê got:

Baş e; lê belê Rebbê min, ji min re ferman kir û got ku, “Heta du aliya guhdarî nekî hukum mede.” Ka gazî neyarê xwe bike, ez li wî jî guhdarî bikim, li wê gorê em dê qerarekî bidin.”

Û bangî li bayê kir,

“Bayê serê sibê! Ka were li ser giliyê ku ji te tê kirin, tu çi dibêjî?”

Ba, bigurînî hat. Bi hatina bayê li holê ne kermêş ma, ne jî tiştêkî din. Heywana reben ji alîkî ve diçû, ji alîkî ve jî diqîriya û digot:

“Ey Resûlê Xwedê! Hebûna ba tunebûna min e. Ez ê bi çi awayî pê bikaribim?”

TU EVÎNDARÊ TEN Î EZ Ê CAN

Rojekê agahîkî gihîşte Mecnûnê ku li ser evîndariya Leyla ji xwe ve derbas bûbû û bi çolan ketibû. Jê re wiha hat gotin, “Leyla vê sibê dê here filan ciyê, ku tu bilezînî wê tu dê bigîhîjî.”

Cunûn, yanê Mecnûnê ku ketibû çola dînîtiyê, ku agahî girt ka sekin pê dikeve?

Zûzûkan hêştirek dît û panî dayê. Leyla li kurê be, Mecnûn jî divê li wirê be. Lewra perwaneyê dora wê bû, mîna her carî, ber bi ronahiya wê ve bazda.

Têjikeke hêştirê ya ku nû zabû hebû. Bi zor û lawazî pey diya xwe diçû.

Mecnûn çiqas panî didayê hêştir bêhtir dilezand, ku hevsarê wê sist dikir anjî berdida disekinî. Aqilê yekî li Leyla ya wî ya pêş bû, ê din jî li têjika wî ya paş bû.

Gava ku Mecnûn xwe winda dikir piyê hêştirê paş ve dihat, gava bi xwe ve dihat piyê hêştirê pêş ve diçû.

Bi carekî re tiştê ecêb qewimî, Mecnûn bi xwe ve hatibû, çi bibîne!... Li ciyê xwe yê berê ye.

Ji hêştirê re got:

“Hevrê, em herdû jî evîndar in. Ez yê Leyla, tu yê têjika xwe. Em rê li ber hev digrin. Ev li hevrêtiyê nayê; lewra tu evîndarê ten î ez ê can im. Divê em ji hev biqetin.”

DILÊMIN NE GIRÊDAYÎ YE

Rêya alimekî ketibû timarxanê, xwe bi xwe got: “Ka ez herim bigerim, rewşa dînan bibînim!” û li derî da.

Ku ket hundir, dît ku dînekî ku dest û piyê wî girêdayiye ji kêfan qîrînî dike û serxweş bûye. Çû ba wî û got:

“Yaw, dest û piyên te girêdayî ne, ev kêfa ku tû dikî çi ye? Tu girêdayî yî, qey tu halê xwe nabîni?”

Dîn wiha got:

“Erê, dest û piyê min girêdayî ne; lê belê dilê min ne girêdayî ye. Piştî ku dilê min azad be, ez bûme dîl dê çi bibe? Du alemê ku tu dibê jî çi ne? Behrek, navê wê jî dil. Ha, di vê behrê de azad im ez.”

ŞÊRÊ MIRINÊ

Merivek miribû. Darbesta wî li ser destan bû û dibirin. Meczûbekî ku ji eşka Xwedê ji xwe ve derbas bûbû, nêz bû û pirsî,

“Ev mêrê ku ji destê şêrê mirinê nefilitiye kî ye gelo?”

Gotin “Qey tu wî nas nakî? Pêlewanê herî bi qewet ê welatê me bû.”

Derwêş got:

“Himm... Nexwe pêlewanê herî biqewet ê vî welatî bû he? Reben... Înşallah fikiriye ku wê rojekê bi şêrê mirinê re jî şer bike.”

ÇÎROKA PAYKIRINA BI BAŞAN RE

Derwêşek, rojekê li çolê digeriya. Di wê hênê de roviyek bêling dît. Lê matmayî ma. Ji xwe re got “Gelo ev heywana reben çawan dijî, çi dixwe çi vedixwe?” û ji lutf û kerema Xwedê re hejmetkar ma.

Di wê heynê de şerekî derket û hat, di devê wî de çeçelek hebû. Heywanê bihişmet û sawdar hinekî ji nêçîra xwe xwar, piştî ku têr bû ê ku ma hişt û çû. Rovî xwe kaşî xwarina ku ji ber şêr mabû kir û binoşcanî xwar, zikê xwe têr kir. Vî derwêşî dît ku xwarina rovî hate ber piyê wî, xwe bi xwe fikirî û got:

“Xwedayê ku rizqê rovî dişîne ber piyê wî, dê çima yê min neşîne? Ne hewceye ku ez bixebitim, ez ê li ciyekî rûnê. Ku Xwedê nisîb neke, şêr ku şêr e jî, bi wê şêrtiya xwe nikare xwarinê bibîne.”

Wekî ku difikirî kir.

Bi gotina xwe ya “Rizqê min ji gencîneyên veşartî yên Xwedê dê bê, ne hewceye ez xîret bikim.” dest bi seknê kir. Sekinî, sekinî... Ne kes tê, ne jî diçe...

Roj hatin û çûn. Derwêş lewaz bû, wisa heliya ku ma çerm û hestî. Di bêqewetî û rewşeke ji qudûmketî de, dengê ji mîhraba mizgeftê bihîst. Wî dengî digot:

“Ey merivê tiral! Çima tu xwe mîna roviyekî bêpê dibînî û mîna evdalokan rûdinêyî? Rabe! Bibe wek şêrê ku parçe dike. Dev ji lêviya xwarina ku ji ber kesê din wê bibîne berde. Ê ku bi te bikeve êdî ne xwarin e, dev jê berdana xwarinê ye. Ê ku ji aliyê qewetê ve mîna şêr be, ka lêviya xwarinê disekine? De haydê rabe! Milan hilde! Bixebite û rizqê xwe bi dest bixe. Him bixwe him jî bide kesên hewcedar.”

Ey mirovê cîwan!

Destê xwe dirêjî extiyar û feqîran bike. Bi gotina “Destê min bigrin” destê xwe dirêjî kesî meke. Xwedê alîkarê wan kesane ku ji bo dilşadiya kesên din dixebitin. Di serê mirovê ku naxebite de mêjî tune ye. Serê wan mirovan ji çermekî ziwa pêk tê.

Kesê ku ji evdê Xwedê re başî bike, dê li her du dunyayan jî başiyê bibîne. Di rêya Babendîkîşê de hêştirvanekî ji kurê xwe re wiha gotibû:

“Lawo, xwarina xwe bi kesên baş re payî bike. Lewra kesên baş bêhevalan xwarinê naxwun.”

KESÊ KU BIKEVE AGIR JI ŞEWITÎNÊ XELAS NABE

Wezîrê ku padîşah ew ji karê wî dûr xistibû, gihîştibû derwêşan. Dilê wî şikestî, aqilê wî tevlihevbiyî bû. Dil dewlemendiya dostê Xwedê, van birînên wî derbas kirin, mijê di dilê wî de belav bû.

Dem di ser de derbas bûn, ji nû ve padîşah pê re têkilî danî. Ji bo vegere karê xwe gazî kirê; lê belê qebûl nekir û wiha got:

“Ji wezîfe dîrxistina ji aliyê kesê bîaqil ve, ji xebatîne çêtir e.”

Padîşah got:

“Hemin tu wezîfe qebûl nakî, qet nebe kesekî ku ji pirsgerêkê welat fêm bike û ji heqê kar û barê welat were der ji me re bibêje.”

Wezîr wiha bersivand:

“Aqilê kê hebe, xwe nake nav karekî wiha.” û jê re çîrokek vegot:

“*Ji kerê pirsîne, “Çima tu li pey şêr digeri?”*”

Kerê wiha gotiye:

“*Him tiştê ku ji ber nêçîra wî dimîne dixwum, him jî xwe dispêrim siya qeweta wî û bi vî awayî li hemberî talûkeyên dijminên xwe, xwe biewle dibînim.*”

Ku hat gotin, “Lê çima tu xwe nêzî wî nakî?””

Kerê gotiye:

“*Li ba wî xwe biewle dibînim; lê belê ku hêrsbibe bextê wî namîne, ji ber vê yekê ji hêrsbûna wî ne bawerim.*”

Wezîr piştî ku vê meselê vegot, gotina xwe berdewam kir,

“Ê ku baweriya xwe bi agir tîne, dikare sed salî agir pêxistî bêle; lê belê ku bikeve nav agir ji şewatê xelas nabe.”

RONDIKÊN ÇAVÊ BAYEZÎD

Xirîstiyaneke ku zunnar*a wî li kêleka wî girêdayîbû, rojekê ji erasê rabû û hat ba Bayezîd. Piştî ku qasekê mijûl bûn, ji gumanê xwe paqij bû û bû misilman. Zunnara xwe jî qetand, avêt û got:

“Bi dil û can îman bi Xwedê tînim û dîsa bawer dikim ku, Hezretî Muhemmed jî qasidê wî yê dawiyê ye.”

Ku Îsewî bû misilman û xwe teslîmê heqîqetê kir, hêstir ji çavên şêx de hatin xwarê. Bi coşiya şahidiya hîdayetê dilê wî xweş bû û ji kêfan giriya. Qasekê baş giriya. Yekî ku li wirê bû got:

“Şêxe min, çima tu digiriy? Niha çaxa dilşayî yê ye.”

Ku stêrkê Bayezîd sekinîn got:

“Piştî heftê salî ew bû misilman. Xirîstiyaneke, zunnara li kêleka wî ve girêday avêt û bi yek carekê ve zirara xwe fetilande karê. Lê îca ku wê zunnarê, li piştta min girêbidin ez ê çi bikim? Giriye min hinek jî ji ber vê yekê ye.”

* **Zunnar:** Tiştêkî mîna egalê ye ku serên wî girêdayîne û ji aliyê keşeyên Xirîstiyana ve li piştê tê girêdan.

BÎRA XIRANDINÊ

Li welatekî padîşahek û kurekî wî yê ku ji canê xwe zêdetir jê hez dikir hebû. Ji mamosteyan ders sitendibû, ji aliyê zanînê ve çî jê re lazim be xwe pê gîhandibû. Welîahtekî pir baş gihîştî û xwendabû.

Ku fermana Xwedê bata û Padîşah ji dinê koç bikira, tenê kesê ku wê bibûya warisê wî ew bû. Şevê Padîşah di xewna xwe de dît ku kurê wî miriye. Di nav vê xewnê de bi tirseka mezin şiyar bû. Gava dît xewne, bêhna wî derket û got:

“Şikur ku xewn e!”

Ji ber ku tiştê dît xewn bûn hinekî bêhna wî derketibû; lê belê dîsa jî wasewasek ket nav dilê wî.

Xwe bi xwe fikirî û got:

“Warisê textê min tenê ew e, îca ku bimire ez ê çî bikim?”

Bi carekê ve qerara zewicandina wî da. Gava jê re neviyek çêbibûya dibû ku hinekî xwe baş bidîta û dilê wî fireh bibûya.

Geriya û pirsî, paşiyê qîza derwêşekî ku bi xwe feqîr; lê belê dil zengîn dît û bûn xwezgînî. Ku xwezgînî padîşah be êdî avên çeman disekin. Derwêş qîza xwe da. Her çendî jina padîşah li dij viya derketibû û gotibû:

“Tu çawan qîza derwêşekî feqîr layiqê kurê min dibînî?”

Lêbelê padîşah jî jê re gotibû:

“Feqîrbûn ne kêmasiyek e. Serî ew e ku dilê meriv zengîn be.”

Derwêş qîza xwe dabû û haziriyê dawetê destpêkiribûn. Lê belê kurê padîşah ji zewacê re ne amadebû. Lewra ew di binê sêhra jineke Kabîlî de dipirpitî û digevizî. Jinikê lawik kiribû evîndarê xwe. Wisa girêdayê jinikêbû ku li ser wê dîn dibû, ji bo wê her tiştî dabû ber çavê xwe. Te digot qey ne warisekî text e, xulamekî zincîrkirî ye.

Tiştê ku jinikê digot dikir, tiştê ku dixwest dianî, çî nedixwest jî jê dûr dixist. Bêqewet ketibû, lewaz bûbû û wekî mirovekî nîv serxweşî digeriya.

Ku Padîşah vê rewşê hisiya, kete nav xemgînî û diltirsiyê. Mat ma dê çî bike. Di welat de çiqas hekîm, sêhrvan, falvan û bijîjk hene gazî hemûyan kir. Ji wan xwest ku ji bo ku kurê wî xelas bikin çî hewce be bê kirin.

Ji alîkîdin ve jî gazî û hewara xwe ji Xwedê re dikir ku kurê wî jê re vegeîne. Dawiyê yekî ku di karê sêhrê de pêş de çûbû hat qesrê. Li kurê padîşah guhdarî kir, pê re hemhal bû, ji derdê wî fêmkir. Hat ba Padîşah û jê re got:

“Sultanê min bila dilê we fireh be. Jinik gelek xerab e. Jineka wisa ne ku her sêhrvan zû bi zû ji heqê wê neyê der. Lê belê ez ê meselê çareser bikim, xemgîn mebin.”

Û pê re mijûl bû, dawîya dawî tiştê ku got kir, kurê padîşah ji jinikê xelas bû. Çawan ku kurê padîşah bi xwe ve hat, bazda ba bavê xwe û got:

“Ji ber ku min tu xemgîn kirî min bibexşîne.” Destê wî maçî kir, lêborîn xwest. Ji nû ve haziriya dawetê kirin. Padîşah ferman kir ku ji bo şahiyeka ku li gor şana wî be çi hewce be bê kirin. Jinika sêhrbez jî ji dilxemgîniya xwe miribû. Dawet hat li dar xistin, şeva dawetê zava û bûk kişiyên odeya xwe.

Bi derbasbûna odê kurê padîşah çi bibîne... Xweşikbûneka ku li berê çav didelin, sûretekî xwedî ronahiyek bibirbisok, çavên mezin ê çavdûçik, gelpikê mîna sêva, lêvên bigezo...

Xwe bi xwe got:

“Ya Rebbî! Ev çi xweşikiye?”

Di navê de salek derbas bûbû.

Bav û kur rûniştibûn û mijûl dibûn. Padîşah ji welîahtî pirsî:

“Çawan e, gelo desgirtiya te ya berê qet tê hişê te.” Kurê padîşah wiha bersiv da:

“Lo bavoo! Çi a berê û desgirtiya çi, ez niha li welatê dilşadiyê me, ev bû salek ku ez ji bîra ku meriv tê de dixire xelas bûm.”

“NEBÎ TE JÎ ŞÛŞEYÊN DONÊ GULAN QELAVTIN?”

Bêhnfiroş, ji tûtiya xwe ya ku di dikana xwe de xwedî dikir, pir hez dikir. Tûtî, kêfa dikana bêhnfiroş bû ku bêhnfiroş di dikana xwe de donên ji giyayên cur bi cur çêdikir, dixist şûşeyên xweşik û difirok.

Tûtî, bi kesên ku diçin û dihatin re henekan dikir û kêfa wan dianî. Bi ser de jî wexta ku xwediyê wê ne li dikanê bûya pasvaniya dikanê dikir. Ku biçiya malê an jî mizgeftê, şîreta li tûtiya xwe dikir, dezgeha xwe emanetî wê dikir.

Rojekê ji rojan, ji bo ku here malê firavîna xwe bixwe, ji dikanê derket. Berî ku derkeve, ji tûtiya xwe re got:

“Delalamin, ev der emanetî te, ez ê hahaneka vegerim.”

Tûtî got, “Meraq mekin ezbenî.”

Bêhnfiroş çû mala xwe. Tûtî, çend muşteriyên ku hatin jî, bi gotina “Pişt re werin” vegerandibû.

Tûtî, di refa xwe de xilmaşî bûbû ku hêwirzekî bihîst. Pisîkekî qirase û çavsor pey mişkekî ketibû. Tirsîya, bi tîrsa ku piştî mişk dê pisîk xwe bavê ser wê, ji ciyê xwe hilfiriya. Bi firîna wê tiştê ku bû jî bû êdî... Li şûşê donê gula ket û wan qelavt, şûşe hûr hûr bûn. Piştî wê donê catiriyê, donê nanê û her wiha heta ku şûşe di refan de neman. Pisîkê mişk girtibû; lê belê dikan serûbin bûbû.

Bêhnfiroş hat. Bi hatina wî re qîrîn pê ket. Şûşe şikiyabûn, don rijiyabûn erdê û tûtî jî di quncikekî de qutifibû. Bêhnfiroş xwe wînda kir, tûtiyê girt têra wê lê da. Ji tirsan heywana reben lal bû, pûrtikên wê bere bere weşyan. Ji wê rojê pê ve îfleh nebû.

Bêhtengiya bêhnfiroş derbas bûbû; lê belê çiqas ku heywana reben a ku êdî xeber nedida û ser rût û tirsonek bûbû didît, bi ber xwe diket û xemgîn dibû. Beytarek nema ku nebire balê, dermanek nema ku nedayê. Tiştêkî feyde nekir. Hingî çû nebaş bû.

Rojekê, mirovekî serkudirê ku por lê weşiyabû ket hundirê dikanê. Tûtî hate ziman û got:

“Hey dostê min! Çima serê te rût e? Nebî te jî mîna min şûşeyên donê gulavtin?”

ÇÎROKA PAYKIRINA ADIL

Gur, rovî û şêr bûbûn hevalê hev û ji bo nêçîrê çûbûn daristanê. Heta êvarê gayekî kovî, pezkovîyek û kêroşkek qefaltin. Avêtin ser piştê xwe û vegeriyan şikeftê. Sifreyeke xweşçêkirî raxistin. Dor hat pay kirinê.

Şêr li gur fetilî û got:

“Hadê dostê min, ka vana pay bike em bi noşîcan bixwun.”

Gur hinekî fikirî û got:

“Sultanê min, gayê kovî layiqê te ye, lewra yê di daristanê de bi herî qewet û ku milê wî nayê danînê tu yî. Pezkovî jî bila ji min re be, ê de kêroşk jî ji rovî re dimîne.”

Şêr qûrîn kir û got:

“Kustex, ev paykirineke çawan e, heta ku qralê daristanê li virê be ka pay ji te re dimîne?”

Û bi yek nehpikeke gur avêt erdê û wî parçewesle kir. Ji tirsan çokqurf li rovî ket. Dilerizî li şûna xwe. Şêr, bi dengê hêrs got:

“Çi zûr mayî li min, şapûle! Zû van pay bike!”

Rovî dîtibû dê çî bê serê wî, bi zorê ji şûna xwe rabû û hate ber şêr sitiyê xwe xwar kir û got:

“Ey şahê şahan! Hûnê kêroşkê di taştê de bixwun, di firavînê de jî êxniya pez wê ji we re baş be, di şîvê de jî hunê ga bi noşîcan bixwun.”

Şêr keneke hibhibî kir û got:

“Dostê min, tu ji kê derê hînî vê paykirina adil bûyî?”

Rovî, li gurê ku di nav xweynê de can daye nihêrt û got:

“Ezbenî, ji vî evdê we yê kustex.”

AQILÊ KESÊ DÎN

Mêrikekî, ji bo ku pirsgirêkeke xwe pêra nîqaş bike li aqilmendekî digeriya. Dostekî wî jê re got “Li welatê me mirovekî ku xwe li dînîtiyê daniye heye.” Mêrik ket meraqê û jê pirsî, “Ka ji min re behs bike, ev mirov yekî çawan e?”

Dostê wî got “Welle... Li darikekî siwar dibe, zarok didin pey wî, ew jî li kuça bazdide digere; lê belê ji wî aqiltir kesekî nabînî li wan deran. Ew aqilmendekî wisa ye ku kirasê dînîtiyê li xwe kiriye.”

Li ser van gotinan mêrik rabû çû bajarê ku dînê aqilmend lê dijî. Bi riya pirsînê wî dît û bang lê kir:

“Lo siwaro! Hespê xwe ber bi virê ve bajo!”

Ew mirov dîsa li darikekî ku ji xwe re kiribû mîna hespê siwar bûbû û dibezand. Hat li balê sekinî û got:

“Çi ye?” Zû bêje hespê min ne cirxweş e, li şûna xwe nasekine.

Mêrik jê re got:

“Dixwazim ji te tiştêkî bipirsim.”

Dînê aqilmend got:

“Zû bipirse!”

Mêrik got:

“Dilê min heye bizewicim. Gelo divê ku ez jineke çawan bibînim ku pê dilgeş bibim?”

Dîn jê re got:

“Sê cure jin hene. Yek jê derd, a duduyan mîhnet a sisiyan jî zînet. Ya pêşî ji te re nabe yar. Ya duduya nîvê wê bi te re, nîvê din wê ne bi te re be. A sisiyan wê bi tevayî bibe yê te.”

Û bi lez hespê xwe ya bi darik ajot û dût çû. Mêrik jî bi bayê bezê dû ket û got:

“Bisekine! Neçe, hinekî bi kitekityê vîna ji min re vebêje.”

Dîn, hespê xwe tebitand û got:

“A yekem jinebî ya bi zarûzêç e. Hezkirina xwe bêhtir dide zarokê xwe yê ku ji mêrê wê yê berê çêbûye. Tim bi bîranînên xwe yên berê dijî. A duyem tenê jinebî ye. Nêvî wê yê te ye; nêvî din jî ê mêrê wê yê berê ye. A sêyem ewe ku qet nezewiciye. Ew bi tevayî yê te ye.”

Gava ku gotina wî qediya panî da hespa xwe ya bi darik ku bide çargaviyê, mêrik jê re got “Ji kerema xwe re bisekine, ez ê cara dawî tiştêkî ji te bipirsim. Bersiva wê jî bide û wisa here.”

Dîn, got:

“Bilezîne, zarok li benda min in.”

“Digel ku ev çend zanayiya te heye, bi vê leystika dînîtiyê armanca te çi ye?”

Dîn jê re got:

“Tu sîrrê min dipirsî. Wisa be min guhdarî bike: Giregirên bajêr xwestin ku min bikin qadî. Ji min re gotin ku tu zana yî, bi aqil î, em nikarin yekî ji te ehîltir ji vê peywîrê re bibînin. Min nexwest. Ji ber vê yekê min xwe li dînîtiyê danî. Ciyê ku mirov bibe qadî, bila mirov dîn be çêtir e.”

Bi qedandina gotina xwe hespa xwe ya ji darik ajot û ket nav zarokan.

ÇÎROKA ÇAVÊ KU DOSTAN DIBÎNE

Gundiyeke, bi merivekî bajarî re bûbû dost. Wexta ku dihat bajêr li mala wî dima, dixwar û vedixwar. Hevalê wî ji bo ku rehet bike tiştê ku ji destê wî dihat fikir. Merivê gundî her cara ku dihat bi gotina, “Tu jî zarokan bîne were ba me, biharê ba me pir xweş dibe” wan vedixwende. Hevalê wî jî digot:

“Ku karê xwe biqedînim îşallah emê werin.”

Bi vî awayî meh û sal derbas bûn. Merivê gundî çiqas dihat bajêr dibû mevanê dostê xwe. Her carî, wan vexwendiyê gundê xwe dikir. Rojekê zarokên merivê bajêrî ji bavê xwe re gotin,

“Bavo, çima em naçin gund? Ew qas xêra te gihîşte wî. Û bi ser de jî ew her dem gazî me dike.”

Mêrik got:

“Rast e, heke em herin baş e; lê belê tê gotin ku *ji xerabiya kesê ku te jê re başî kiriye bitirse*. Dostaniyeka me ya xweş pê re heye. Ez naxwazim ev dostanî xerab bibe.”

Van rojan, dîsa merivê gundî ji wan re agahî şandibû û ew vexwendibû gundê xwe. Bihar bû. Daran kulîlk dabûn, tebîetê kincê xwe yê kesk li xwe dikir. Merivê bajêr zarokên xwe jî rakir û ketin rê.

Çend roj şûn de gihîştin gund. Ji gundiyan mala dostê xwe pirsî. Li ciyekî mîna gund, her kesî hev nas dikir. Yekî ji wan, mala dostê wî nîşan dayê. Li derî xistin nedixistin li wan derî venedikirin. Di vê hênê de ewr û ezman giran bû û baran bariya.

Mêrik li ti derê nedihat dîtin. Qasekî li ber derê wî, li binê baranê sekinîn. Şil bûbûn û li wan sar bû. Hinek derbas bû gava ku mêrik derket û hat. Gotin:

“Yaw, tu li kê derê yî? Em hatin heta gundê te, hindik mabû me te nedîtaya û em bifetiliyana.”

Ê gundî got:

“Ma em hev nas dikin?”

Bajêrî mat ma û got:

“Tu çi dibêjî wiha? Em hev nas dikin, çi gotin e?”

Gundî got:

“Tu li qusûra min menêre, bi rastî min te nas nekir. Êdî haya min ji hebûna min jî tune. Min xwe daye riya Xwedê.”

Bajêrî hêjî mat mayî bû. Got:

“Merivê ku dihat bajêr dibû mêvanê min û ê ku min sifreya xwe jê re vedikir ne tu yî? Li ba min bêtêklîf tu mêvan nedimayî, te em vexwendiyê gundê xwe nedikir?”

Gundî got “Na, ez te nas nakim.”

Bajêrî got “Baş e. Me nas meke; lê belê em şilopilo bûn li ber baranê, dunya jî tarî dibe, qet nebe ciyekî nîşanî me bide; da ku em serê xwe têxinê heta li me dibe sibe.”

Gundî, qulûbeyaya nobedaran a di bexçê xwe de nîşan da û got:

“Hûn dikarin li virê bimînin; lê belê haya we ji we hebe, bi şev gur tînan van deran.”

Bajarî bêçare qebûl kir. Bi zarokên xwe re ketin qulûbeyê. Bi şev xew neket çavê wî. Şûrê xwe, tîr û kevanê xwe amade kir û nobetê girt. Nîvê şevê, wextekî dereng de dengêkî bihîst. Di şivakê de nihêrt; lê belê ji tariyê tiştêkî nedidît.

Bi gotina “Dibe ku gur be” kevanê xwe tikand û tîrê xwe berda nav tariyê. Merivê gundî bi hêwirzeyê şiyar bû û bazda. Got:

“Eywax, te li daşika min da!”

Bajarî got:

“Dahşika çi, ew gur bû!”

Gundî got “Na, te li daşikê da, min ji dengê wî ew nas kir.”

Bajarî xwe êdî negirt û got:

“Hey xerifandiyê bêwefa, di şeva tarî de daşika xwe bi dengê wê nas dikî, di nava rojê de dostê xwe nas nakî. Ji aliyekî din ve jî qet şerm nakî ku tu dibêjî min xwe daye rêya Xwedê. Te şeraba îlahî venexwariye, te dew vexwariye!” û bi ronahiya serê sibê re zarokên xwe rakir û ji gund derketin.

WELATÊ XWOŞEWÎSTÊ

Mecnûnê ku bi evîna Leyla ketibû çolan û bi heywanên kovî, xezalan û xîçikên qûmê re bûbû heval, çawan ku kûçikê dît nas kir. Ev ew bû, ew kûçik bû ku li taxa mala Leyla digeriya.

Pê re rêçek, siyek, bêhnek hebû. Heywanê maçî dikir, bêhn dikir, hişk hemêz dikir û jê re digot:

“Ey mexlûqê ku nîşanek xwoşewîstê li serê heye.” û digiriya. Merivekî ku di wê derê de derbas dibû, xwe negirt û jê pirsî:

“Tu çi dikî? Çima tu kûçikê pîs ê kuçan hemêz dikî?”

Mecnûn wiha bersiv da:

“Ka were, ka were bi çavê min vî mexlûqê ku tu jê re dibêjî pîse binêhêre. Bi wî re bêhna Xwoşewîstê heye. Bi pasvaniya taxa mala Leyla, ew bûye xwedî rûmet. Li dilê wî, ruhê wî û li zanabûna wî binêhêre ku kê derê bijartiye, kê derê ji xwe re kiriye cî û war. Ew kûçikê ku taxa mala Xwoşewîstê ji xwe re kiriye cî û war, xweliya ku pêlê dike jî ji min re pîroz e.”

PÊŞÎ DE PÊŞGIRÎ SITENDIN

Karwan di rê de qonax dabû. Ku bû şev di serî de parêzvan, hemû kes di xew de çûbûn. Bêdengiya mirinê ketibû ser wan. Çitînî dernediket.

Rêbirên ku ketibûn kozikên xwe, dest bi tevgerê kirin. Tam wextê wê bû. Ruh bi canê tu kesî nediket. Te digot qey tevizîne. Talan û tajankirina karwan ji wan re wisa rehet çêbû ku wan jî bawer nedikir. Karwanî, gava ku rabûn çî bibînin, malikê ku tu mîrat bî, malê çî halê çî!..

Serkarwanî, gazî yên ku bişev nobetê girtibûn kir û got:

“Hûn dibêjin ev çî hal e?!”

Yek ji parêzvanan got:

“Dizekan biriye”

Serkarwanî got:

“Saeta we ne xweş be, gelo li ber çavê we çawan diqewime?”

Nobedar got:

“Ez... Mixabin ez di xew de çû me.”

Serkarwanî got:

“Pir baş e, çima tu raketî gelo?”

“Qasekî sekinîm, derûdor di bêdengiyêdabû, min jî got tişteki nabe.”

Serkarwanî got:

“Lê min ji we re nego bi tedbîr bin?”

Nobedar bersiv da:

“We got; lê belê...”

Serkarwanî nobedar ji karwanê avêt; lê belê fikirî ku divê tedbîr pêşî bê sitendin. Bi viya xwe sûcdar dît û got:

“Tedbîr ku te got, heke ku di serê pêşî de neyê sitendin bereday e.”

ÇÎROKA FESÊ

Rêwiyekî ku di rêya Xwedê de bû, feseke mezîna dabû serê xwe. Biçûya kê derê wî ew jî serê xwe danetanî.

Serê sibeyekê jî mala xwe derket û diçû dergahê. Dizekî li averêyê kuçê xwe veşartibû û li benda wî bû. Derwêş çawan ku hate ciyekê bêdeng, diz fesa wî jî serê wî revand û bazda.

Derwêş bi serê de qêriya:

“Bisekine! Şaşikê veke, zikê wî bibîne hê nû bibe.”

Diz bi hewle ruhê direviya, jî aliyekî ve jî şaşik vedikir... Vekir lê çi bibîne... Nava fesê tije potikên bereday û perçeyên pembû bûn. Ma ma di destê wî de tenê piçek potik ma. Hêrs bû, wî jî avêt erdê û got:

“Min jî digot qey di nav vî tiştê tiftifî de bi metra wê qumaş hebe, tu çi hîlekarî!”

Derwêş got:

“Belê kurê min, ha tu bizanibe ku dunya jî eynî wiha ye.”

AQILÊ KERA

Kerekî xwê barkirî di çem de derbas dibû. Wexta ku di nav avê de dimeşiya piyê wî şemitî û qelibî nav avê. Xwê di nav avê de heliya.

Gava ku ker rabû û dît ku barê wî sivik bûye, bi şemitîna lingê xwe kêfxweş bû. Rojekê jî xwedyê wî singêr lê bar kir. Ker, hîn bû ya ku bar di nav avê de sivik dibe!

Çawan ku gihîşt çem, lingê wî şemitî neşemitî tafilê xwe pîj kir nav avê. Singêr hingê avê kişandin nava xwe perçifn. Wisa giran bûn ku ker kir nekir nikaribû rabe ser xwe û di ciyê xwe de mirar çû.

EDALETA HEZRETÎ UMER

Hezretî Umer ku Emîrê mumînan bû û bi edaleta xwe li cîhanê navûdeng dabû, rojekê li Medîneyê bi heriyê dîwar çêdikir. Cihûyek hate balê ku giliyê hakimê Besrayê bike. Xelîfe jê pirsî “Tu ji çiyê wî gilî dikî?”

Mûsewî got:

“Ji min malekî ku sed hezar dîrhembû sitend. Perê min nade, min mijûl dike.”

Xelîfe pirsî:

“Bi te re kaxiz heye gelo?”

Mûsewî got, “Na.”

Hz. Umer li ser firaqekê wiha nivisand:

“Kesên ku giliyê te dikin pir in, ên ji te xweşin hindik in. Ya ji karê ku dibin sedemê gilîbûna te xwe dûr bigre, an jî dev ji hakimiyê berde.” Li bin wê jî wiha îmze kir:

“Umerê kurê Xettab”

Mora xwe lênedana.

Lê belê her kesî dizanibû ku adil e û li xatirê çavê kesî nanihêre.

Mûsewî, firaq bir û da hakimê Besrayê.

Hakim çawan ku xwend, ji hespa xwe peya bû, erdê maçî kir û zûzûkan deynê cihûyê li ser xwe da.

DAWIYA ŞERMEZARKIRINÊ

Li mizgeftê çar merivan nimêj dikirin. Di vê navberê de muezîn ket hundir. Yekî ji wanê ku nimêj dikirin, bê hemdê xwe ji muezîn pirsî:

“Te bang da?”

Merivê balê bi dengekî hêrsî got:

“Hişe! Tu nizanî ku mirov xeberde nimêja meriv betal dibe?”

Ê ba wî ket nav gotinê û îca got:

“Tu wî şermezar dikî; lê belê... Te nimêja xwe betal kir.”

Ê çaran xwe tevitand û xwe bi xwe got:

“Oox, Xwedawo şikur ji te re, nimêja min betal nebû.”

LI SER DERÎ SERÎ DANÎN

Mecûsiyek extiyar ketibû înzivayê. Bi kesî re hevdîtin nedikir û dernediket derva. Tevayî wexta xwe bi xizmet û perestina senemê xwe derbas dikir. Çend sal şûn de lazmatiya wî bi tiştêkî çêbû. Got ez ê çî bikim çî nekim û bazda ber bi senemê ve. Li ber wî xwe xwar kir, sujde kir û hewar û gaziya xwe pê anî û got:

“Tenê tu dikarî alîkariya min bikî, ez mehf bûm, qediyam, mirim.”

Hewarû gazî kir; lê belê bi tu awayî tiştêkî nebû, karê wî neket rê, ji derdê xwe re derman nedî.

Kevîrekî bêcan, ku nikare mêşa li serê datîne berîdê, wê çawan alîkariya mirov bike?

Li ser vî Mecûsî dîn û har bû. Bi qêrînî got:

“Ew qas zeman min perestina te kir. Di demeke ew qas ku hewcedarim, tu ji tu karî re nabî. Ji destê te tiştêk nayê, ez ê dev ji te berdim, êdî ez ê berê xwe bidim Xaliqê kaînatê...”

Hê ku li hemberî senem bû, Xwedê meylbûna di dilê Mecûsî da pêk anî. Dostekî Xwedê ku di rêya hînbûna rastiya de gelek pêş ketibû, ji vegeîna ku Mécûsî dijiya re hejmetkar ma. Xwe bi xwe wiha digot:

“Digel ku li ber senem ji xwe ve çûbû, serxweşbû, bê îbadetbû û Xwedê nas nedikir; Xwedê ew gihîştand xwesteka wî.

Dema ku di hişê wî de vana derbas dibûn, dengêkî bihîst, wî dengî jê re digot:

“Wî li ber senem pir zêde hewar û gazî kir. Lê belê daxwaziya wî nebû. Ku dergaha me de daxwaziya wî pêk nehata, di navbera senem û Semed de çî cudayî dima?”

Gelî dostan!

Mirov ji seneman zêdetir bêqewet in, dilê xwe bi Semed ve girê de. Kesê ku li ser vî deriyê serî deyne vala venagere.

Ey Rebbê min!

Em bi destê xwe yê vala; lê belê bi dilê xwe yê hêvîdar hatin hizûra te. Me bibexşîne.

STRIYÊ XWOŞEWÎSTÊ

Rojekê fersend ketibû destê Mecnûn û bi Leyla re tenê ma bû. Leyla jê re got:

“Ey evîndar, çiyê te hebe bîne.”

Mecnûn got:

“Lê rûheyvê!... Bi evîna te ne ava min ma ne jî bîra min. Di kezeba min de ne hinek av maye, ne jî bi şevan xew dikeve çavên min. Evîna te aqilê min ji serê min kir, niha tenê canekê min maye, lêviya fermanekî te me. Ku tu canê min bixwazî hanhanka didim.”

Leyla got:

“Lo egîto!.. Ez viya kengê ji te bixwazim dikarim bistînim, wekî din çiyê te heye?”

Mecnûnê derziyek da Leylayê û got:

“Di her du dunyayan de niha mal û milkê min hebe tunebe ev e. Di temamê alema hebûnê de tiştê ku ez xwediyê wî me ev e, ji xeynî viya destê min vala ye, tiştêkî min tune. Vê derziyê jî ji bo vî awayê li ba xwe dihêlim: Li çol û deşta pir dikevim erdê. Ax, ê ku dilê min sitendiye! Ku te temaşe dikim dikevim erdê, wekî gulê di lingê min de strî diçin, bi vê derziyê wan striyan derdixim.”

Wê gavê Leylayê jî ji Mecnûnê re got:

“Heta niha ez jî li viya digeriyam. Ku evîna te rast be, ne şerme ku ev derzî bi te re be? Ax, evîndarê belawela yê dilcoş! Wexta ku li min bigerî û di lingên te de strî herin, bi te nakeve ku tu bi vê derziyê wan striyan derxî, ku tu derxî ev dibe bêwefayî. Yek strîkî ku ew qas xwediyê gihîştîbûnê ye. Ew her dem çawîşîya riya xwe dike. Heyfe ku meriv wî bi derziyê derxe. Ji vexwarina xweyna dil pêştir tiştêkî din bi te nake ve. Ku di rêya me de strî di lingên te de herin, divê tu wî wekî gulekî ku bi kincê te ve hatiye lêxistin bihesibînî. Di vî karî de qey tu ji şitilê gulê xwardatirî ku ew ji bo ku gul bi dest bixe salekê sebir dike. Ew striyê ku ji evîna Leylayê di lingên te de diçin, çêtire bi sedan destegulên ku xelk ji te re diyarî bikin.”

ÇÎROKA KERPIÇAN

Merivekî ku ji tîna kezeba wî dişewitî, li qeraxa çem ser dîwarê bilindê kerpîç rûniştibû. Çawan masiyê ku ji avê dertê û ji bo ku bifetile avê dipirpîte, wisa jî ev meriv ji bo ku bigihîje avê hewl dida. Lê çî feyde dîwar bilind bû, kir nekir gihîştina avê nemimkûn bû.

Qasek şûn de çavê wî çûn ser kerpîçê dîwar ê ku li serê rûniştibû. Zêde rewa girtibûn û kevn bûbûn. Piştî hewldaneke dûr û dirêj yek ji wan jêkir. Girt û avêt nav evê. Dengê ku derket, wekî dengê aveka ji çaviyê dertê hate guhê wî. Wekî dengê şêrîn ê xwoşewîstê, dengê ku meriv serxweş dike.

Kerpîçekî dinê jî rakir û avêt avê. Bi kêf li wî dengê guhdarî kir. Kerpîçekî din jî rakir.. Yekî din, yekî din... Bi vî awayê xwe di nav çöşiyê de dît, lezand. Di her avêtinê de, dibê qey avê wiha dipirsî:

“Bi avêtina van kerpîça ji te tirê qey dê çî bikeve destê te?”

Meriv, bang li avê kir û got:

“Du feydê wî hene. Yek jê kezeva min a ji tîna dişewite hênik dike. Dirûvê dengê te, dide dengê Îsrafil. Ew dengê ku mirî pê zindî dibe û guh didinê. Giyayê ku lêviya avê ne, şînayî û kulîlkê ku dengê ewr û ezman ê mizgîniya baranê didin dibihîzin, di rojên germa havînê de... Feydeka wî ya din jî, her kerpîçê ku ez diavêjim, hinekî din min nêzîkê te dîkin.”
